Lêkolîneke Rexneyî

Romansiyet, di Helbesta Cegerxwîn de

Xalis Misewer
Xalis@myway.com



Berya her tiştî, divabe em ji xwe pirsbikin: Cegerxwîn ew helbestvanê, ku bi helbesta kilasîk di nav Kurda de, hatiye naskirin. Gelo hesta wî, li ber pêlên bayê romansiyetê nehatibû hejandin..? yan jî giyanê wî pê nehatibû sûtin..?. Em van pirsan ji lêkolînerên Kurd dikin, ji ber ku ta nuha, me nediye kesekî ji van rewşenbîr û lêkolînerên wêjeya Kurdî, ev aliyê helbestî yê herî giring, ji xwe re nekiribûn karûbar û lê nekiriyane. Eger ku mirov li helbestê vî ristvanê navdar, bi çavekî rexneyî binêre, wê mirov wê çaxê şopa romansiyeteke zelal, di wan helbestên bi sitiran û mozîk, û bi evîn û nalenal hatine afirandin de, xweş bibîne.

Ji ber ku hin karîzmên romansiyetê jî evin Evîn û pîrek tevlihevbûna bi xuristê re êş û bêzarî - welat parêzî û netewî û ramaneke zîrekî û bêtirs….hwd.

Tevlî ku evna hemû hokarên romansiyetêne, û di helbestên Seyda de hatine ristin jî, lê mîna me goti bû- hê tu lêkolînerên Kurd helbestên

wî bi romansîyetê nişan ne dane. Ew mîna helbestvanekî kilasîk bi tenê dane nasîn!. Ez gûmandikim evna jî zordarîke mezine, di mafê Seydayê me de pêktê. Ji ber wilo em dixwazin divê babetê de li gorî zanebûna me emê rastiyeke rexneyî di virada bidin xuyakirin, û dirustiyê û neduristiyê ji hev bidin alî, û ku hinek mafê Seyda li me hebe, emê mafî wî ta ji me bê- lêvegerînin, û bi ber destê wî de bigihînin.

Inca ku em li helbestê wî baş binêrin, emê bibînin ku Seyda , xwe baş berdaye hinav û rivîna giyanê romansiyetê, û ew bûye bilbilê evînê û xurista Kurdistana xwey rengîn, ev welatê ku mîna gulîstan û bihuştên erdê dibîne, û bi hezkirin û bi dilekî şewat di pesinîne.

Helbesta romansî bi peyvên xwe yên nerim û kovan, û bi mozîka xwe ya hêdî û zelal, û bi rengê sitiranî ji hesta giyanê wî dertê. Wuha xeyaleke fereh, û hesteke bilind, di wan peyvên ku ji hundirê dil û giyanê helbestvan dertên de heye, û helbestvanê romansî qafiya xwey helbestî, di yek sirûdê de bi awakî cuda û cûrbecûr avadike. Bêgûman ev tiştana jî li bal Seydayê Cegerxwîn peydadibin, û li ser rûpelê dilê xwe yê kovan û birîndar, kul û derdên xwe radixe, û xwena xwe ya şêrîn wuha şîrove dikê: Welatekî serbixwe, bê axe û begler, û jiyaneke sefiraz û bi ewle. Wuha jî Seyda bi asîmanê hezkirin û wekheviyê ve radipelike, û ji hêviyeke mirovantî, û paşerojeke xweş û geş, bi kêf û şahî di helbestên xwe de distire.

Lê ez dibêjim ku Seydayê Cegerxwên pirê caran di helbestên xwe de, kilasîk, sembol û romansiyetê jî bi hev re pîktîne, evna jî hunereke bilind derdixe wê navê, ji ber wilo wêjevanê rûsî yê mezin (Meksîm Gorgî) û (Komoco) yê mezin ji Çînê, dibêjin: (Wêjevanê mezin herdem di wêjeya xwe de, rastiyê ku nêzî kilasîkêye, û romansiyetê tevlihev di dêre). Ango ligor vê nerînê, tevlihevkirina van hokaran, wate û wêneyên ristî yê xweşik û hêja têne afirandin, wuha jî dibêjim: Ku Seyda di piranya helbestên xwe de, ji aliyê naverok û wêjeyê de jî, sê beşên wêjeyî - nemaze di warê helbestên siyasî de - mîna me goti bû- tevlihev di dêre, ew jî - Kilasîk- Romansiyet- û Sembolin.

Ez gûmandikim bi vîhawî, wê helbesteke rewan û zîrek bêne nasîn. Lê ew sembolên di helbesta xwey siyasî de pir bikartîne, ew jî dilber - û welate- ango di gelek ciyan de, dilber û welatê wî dimine yek gewde, û bi vî hawî diçe pesnê xurista welêt bi awakî xweş û zelal di de.

Piştî vê pêşgotina kurt û zelal, emê nuha bên li Seydayê xwe guhdarbikin, bê ka romansiyet, û kilasîk, û sembol, çawa di bin sîka

perda helbesta wî re têne xuyakirin.
Di sirûdeke xwe de Seyda wuha dibêje:
Li hawîr gul û çîçek û geya
di ser mera pir bilindin çiya
Şîpên avêne diçin ber bi jêr
Çuqlî di hejin sor û kesk û zer
Ez xweş dikişênim hilmê ji sorgul
Xweş tê guhê min awazê bilbil
Di nav ava de ordek û qazin
Li ser latan xweş şahîn û bazin

Tevlî ku di van malikên helbestî de, bi rengekî rasterast û kilasîk, û bêyî xeyaleke fereh wêneyên xwe yê lêkdayî, mîna firça hunermend, hinbihin bi gotinên mîna - gul- çîçek- geya- çiya-- şîpên avê - çuqlî - sor û kesk û zer- awazê bilbil- ordek qaz - şahîn- ava berjêr bûyî- anîne danîn, lê bi pêlewanî lewha xwey romansî, ji xurista dora xwe re afirandiye. Xweşikbûna xurista cih bi peyva li hawîr- di van malikên bi sitiran û awaz de, baş bi hev ve hûnandiye, nizim û bilind, bi hev ve girê di de, û çiyayên bilind, mîna xem û xeyalên xweyî giran, li ser deşta bi av û gul û çîçekên sor û kesk û zer, û bi payebilindî û hêlemêl, van çiyayan bi cih û war dike, wêneyeke romansî û bihareke geş, ku bi rengên ala kurdistanê, sor û kesk û zer, hatiye xemilandin, xweş di de nasîn, ta li ber bedewbûn û xweşbûna vê bihuşta erdê, hesta mirov tevdirabe û geşbûneke bê hemta, di dilê mirov de tê afirandin.
Ji aliyê derve de jî, ango ji aliyê kêş û qafiyê de, awazekî resen û mozêkeke pir zelal li ber guhê mirov dikeve. Seydayê helbestvan û evîndar, ji derve û ji hundir de, di naverok û peyv û hevokên xwe de, bi awakî romansî û kilasîk, cawê helbesta xwe yê rengîn, ku mîna xurista Kurdistanêye, bi hev ve girê di de, û li tevna xwe dixe.
Û dibêje:
Şêrînkenê, lêvşekirê
Agir di nêva cigerê
Ahî ji destê te evîn
Şeker kenê, lêv hingivê
Jehr û mirin bî, min divê
Ahî ji destê te evîn
Li vira ev malikana dîsa bi şêweyeke romansî, û bi helbesteke bi sitiranî û awaz hatiye li darxistin, lê bi peyv û hevokin lêkdayî, teqlîdî û kilasîk hatine hûnandin, kesîtiya helbestvan jî tê de xweş cih



digire, ji ber ku ew bi cênavê axaftinvan hatiye, û ferhenga Seyda ya helbestî nemaze di warê xuristiyê û evînê de, pêhtir ji hevokên rewşane yên pir hesan û zelal pêktên mîna - /şêrîn - kenê/ lêv şekirê/ şekir kenê/ lêv hingivê/ û tiştên ne diyar ber biçav, û bi laş û gewde dikê.

Em dinêrin, bê çiqas bi van hevokên hesan û mîna me gotibû bi lêkdaneke kilasîkin, lê bi xeyal û naverokeke romansî, bi vê helbesta xwey siyasî pesnê yara xwe dide. Wuha jî divira de tê xuyakirin, ku gelek caran peyva şêrîn di van malikan de pêktê, û dûbare dibê, ew jî tê wê manê, ku ev helbest li ser zoqa û hestên laş xwe avadikê, û şêrînbûn cihekî bilind di van hestan de digirê. Ez dibêjim: Ku ev tişt pêwendiya wê, bi kelepûr û abûrî û xurista Kurdistanê ve heye, ji ber ku Kurdistan ji alîkî ve - bi şêraniya xwe pir navdare mîna: tirih mewîj bastêq dimis qerqîtik - helaw- ji aliyê din ve jî miletê Kurd, mîna hemû miletên rojhilatanavîn hevqasî di bajarvaniyê de neçûye, û tê xuyakirin ku miletên vê navça dîrokî, kêfa wan pir ji şêranî re tê. Ji ber wilo mirovê Kurd yara xwe û welatê xwe herdem bi şekir û şêranî pesin dide, û ta di meselak xwe de jî dbêje: (Şam şekire welat jê şêrîntire).

Dîsanê em karin bêjin: Ku rista - Ahî ji destê te evîn- di sirûdê de gelek caran dûbare dibe, û weke ku di warê rexnê de tê zanîn, dûbarekirina helbestvan ji eynên ristan re, di yek sirûdê de, tê wî wateyê, ku ew dixawze ramanên di naveroka wan ristan de teqzebikê, xwendevanê xwe bi wan hayedar û micûlbikê, û bala wî bikişîne, ji ber wilo livira jî dixwaze, ahîn, û rivîna giyanê xwe, û sûtin, û kela hinava xwe, ji mere bi vê ristên evîndar bide xuyakirin.

Bêgûman ev gotin ji ezmûnên helbestvan yên helbestî dertên, ev gotinên ku bi wateyeke romansî têne xuyakirin, ew peyvên bi xaka Kurdistanê ve girêdayîne tênbikaranîn. Wuha jî helbestvan yara xwe - ku ew jî, ji xurista Kurdistanê re nîşan û sembole - bi etmosfêreke romansî, û bi bihareke rengîn di xemilîne.

Dîsanê di vê babetê de, Seyda ji yara xwe re disitirê, û dibêje:

Dêmên digeş

Çavên direş
Xalên hebeş
Birhên biweş
Hilde ko her, roj bê derê

Divirada dîsanê di riya nav û rewşanav de, bi wênwyeke pir xweşik pesnê yara xwe di de, û herdem jî yara wî kurdistana rengîne, li vira pesnê ruwê wê yara pesindar, bi mîkanîzmên hevokên nav û rewşa wî pêktên, mîna: /dêmin dikeş/ çavên direş/- xalên - hebeş/ birhên biweş/

ev pesindan jî bêgûman, ahînên kelepûra Kurdî, û şewata giyanê helbestvan tevlihevdike, ku li ba Kurda ji dêmên laşê pîrekê re pesnên pir xweşik û bedewin, û xwedyê cihên rêz û karizmêye, lê ev peyv û hevok û ristên, ku bi wan pesinên rind û hêja ji yara xwe re daye, pirên wan li bal Kurda pesnin folkilorîne, û li bal hemû helbestvanan bi rengekî teqlîdî bikartên, û dîsanê ev malikên xwe, bi kirasê kilasîk û binkirasê romans pêkanîne, ango lewheke hevbeş ji (kilasîkî - romasî) tevlihev ji yara xwe re di afirîne, nemaze di rêza dawî de ku dibêje:

- hilde ko her, roj bê derê.

Ev rêza ha bala mirov pirdikişîne! ji ber ku di rengê wêneyeke helbesta romansî pirxweş de hatiye, ew çavên yara xwe, çaxa mijanka ji ser di de alî, mîna roja dertê dipesinîne, ev wêneyê spehî û nûjen di helbesta Kurdî de, ne rasterast kişandiye, xeyala xwey kûr avêtiye ser vê lewha bedew, ango ne rasterast gotiye - çavête weke rojêne lê wî ji yara xwe xwestiy, di nav wê bihara rengîn de, ku liser ruwê wê yê pesindar hatiye afirandin, mijankê xwe hilde, ta di nav wan re, çavên mêşinî mîna rojê, tîrêjên zêrîn bi şewqûşemal, xwe bi ser dêmên wê bihara ruwî wê ve berde.

Ez gûmandikim, ku ev wêneyê bi zîrekî hatiye afirandin, cara yekem di wêjeya Kurdî de, ji çavê pîrekê re, Seydayê zîrek bikaraniye, kesî berya wî wuha negotiye, ji ber ku Kurd herdem çavan bi du tasan dipesinînin. Di virade tê xuyakirin, tevlî ku pirên wateyên helbestvan bi hesanî têne lêkdan, lê bi awakî rewan û bi kêş û qafiyeke xweş malikên xwe, di bihara helbesta xwe de bicihdike. Dîsa em li vira tînin bîra xwe ku - mîna me gotibo jî - Seydayê me, hersîk mezahiban kilasîk romans sembol- bi hev re li tevna xwe dixe, û cawê xwe yê helbestî pê dihûne, û ev jî zîrekbûneke helbestî pir mezin di de xuyakirin, lê kesin lêkolîner û rexnevanê Kurd, mafê Seyda di vî warî de hê xweşik nedayê.

Seyda çaxa ji miletê xwe re distirê, pir bihara jiyana xwe bi kêfxweşî

di de nasîn, jibo miletê xwe bi ceger û bi hêz bikê, û dibêje:

Pirxweşe pirxweşe Ev Dinya pir xweşe
Yar pal daye ser min Rû wek gula geşe

Di virada, Seydayê Cigerxwîn mîna me gotio jî - pir bi dinê kêfxweşe, û bi omîd û hêviye, ev jî ji dûbarekirina peyva / pir xweşe/ tê nasîn. Kêfxweşya wî tê, ji ber ku yara wî, ya ku ruwê wê weke gula geşe, di himbêza wî de paldaye. Û pesnê xweşikbûna yarê di etmosfêreke romansî de dide, û weke em dizanin yara Seyda jî herdem kurdistane, ku heta roja wî ya dawî li ber dilê wî pir şêrînbû, pir hêvîdarbû ku roja azadiya bê, berya mirina xwe bi çavê serê xwe bibînê.

Wuha tê xuyakirin ku helbestvanê me di vê lewha xuristî de, ji xurû(xas) bi bal gişti ve gavê xwe davêje, ango di neynika bihara xwe û yara xwe de, rengê xurista kurdistanê di pesinîne, ji ber wilo jî me gotibû Seydayê Cigerxwîn cawê helbesta xwe, bi awayekî kilasîk, û sembol, û romansî, bi hev ve girê di de.

Dîsa werin em li Seyda guhdarbikin ku dibêjê: Divê ez nemirim ta azadiya dilbera xwe bibînim.

Roja payîzê lat kirine zêrîn
Şalûl û bilbil li hawîr qêrîn
Mebê Seyda Cigerxweîn boye kal
Divê nemrim heta dilber bibênim.

Payîz li bal kesên romansî, herdem bi helwesta mirinê re elaqeder dibê, tê xuyakirin jî, tevlî ku Seyda xwe di payîza temenê xwe de dibînê, lê payîza wî bi roka xwey zêrîn dinyê xweş û geş dikê, ew jî tê wê manê, ku bi rengekî ne rasterast dibêje: Ez xortim, - mebê Seyda bûye kal- ev jî dan aliyeke zîrekîye, ango payîza bi wateya dawiya temen, li wê navê di de alî, û payîzeke zêrîn û bi hêvî li dewsê datîne, ji ber ku ew di wê baweryê deye, ku tucarî namirê bêyî dilbera xwe azad û serbixwe bibîne, wuha helbestvanême di jiyana xwey swiyasî de, bi hêvî û omîde û miqerisyê û berxwedaneke zor bi mirinê re dikşîne - divê nemirim heta dilber bi bînim- ango helbestvan, xwe pir aşiq û avîndarê welatê bav û kal û cih û meskenê xwe dibînî.

Ji ber ku ev welatê wî yê şêrîn û delal hê dibin destê dijminan de maye, û herdem bi hewes û tirse, ku mirina malikwêran tarîbûna şeva xwe, bi ser çavên wî de berde, ew çavên ku hê ji şewqûşemala dilbera xwe têrnebûne, û ew temenê xwe mîna yê xurta dibînê, ango di vira de serxwebûna welêt bi demê ve girêdi de, û dem sozdare ku kurdistanê nêzîk- dûr - azad bikî.

Ew Kurdistana ku bi rengên, kesk û sor û zer di xemile, hilm û bihna wan dagirtine newal û çax.

Çilpîyên daran zer bûne wek zêr
Siya zinaran xwe berdaye jêr
Sor û kesk û zer bûne pel û şax
Hilmê dagirtin ew newal û çax
Guldestên evînê pêlên derya jînê
Em gihan serbestî sed tif li bindestî

Malika yekem wêneke romansî pir bedew di xwe de pêktîne bi van peyvên mîna- guldestên evînê - pêlên derya jînê vê evînê mîna mirovê bi ruhûcan pesindi de, û jîn mîna pêlên derya dibînê, evna ji hokar û karizmên romansiyetêne, ku wateyên peyvê rasterast nayêne dan, û li wateyan tê zîvirinandin, ango wateya peyvê ya ferhengî di siyaq de tê guhertin, ev wêneyên ha helbestvan nêzî hesta giyanê milet dikin. Syda di xeyalê xwe de digihê azadiyê, û wuha jî sed tifan li bindestiyê dibarîne.

Di vê xwena xweş re helbestvanê me haydar dibe, ku welatê wî azad bûye, û ew û dilbera xwe jî, di bin siya vê azadiyê de bihev şahbûne, vî tiştî jî di wêneyeke gelerî û pir bi livandin afirandiye - sed tif li bindestiyê - ev wêne di de xuyakirin, ku hevqasî derdê bindestiyê miletê Kurd êşandiye, û bêzarîke tarî bi ser de barandiye. Wuha ev herdû malikên dawî, mîna malkên din jî, bi şêweyekî kilasîk, lê bi naverok û wateyên romansî, hatine hûnandin.

Jiber ku mirovên romansî herdem, gelek wêneyên xeyalî di nav helbestên xwe de bi kartînin, herdem li dor reng û hilm û ronahiyê diçin û tên. Di virada dîsa helbestvan li xwendevanê xwe dizîvire, û diyar dike, ku dilbera wî welatê wîye, û ew û dilbera xwe negihane hev, ta herdûk ji bin destiyê nehatine der û rizgarnebûne, ango ev helbestvanê evîndarê welêt, di helwesteke bêkesîtiyê de xwe dibînê, dijminan jî destê wî û yara wî ji hev birîye, û ew û yara xwe bi serhevde bi kêferat û kalekalin, ta xwe gihandine serbestiyê, û sed tif kirine li bindestiyê. Dîsanê ji aliyê peyv û ew hevokên, Seyda bi wan pesnê welatê xwe daye, hevokin di gelepûra Kurda de pir bikartên, ji ber wilo wana gelekî tikrar dikê, mîna lêv şekirê rûkeşê- sorgulê- porşevê- dev li kenê…. Lê bêhtir ji wan hevoka - gula sor bikartîne, çimkî gûmandikim, ku wê jî mîna sembola welatê kurda dibînê, ku ew gul biharê li pesarên çiyayê kurdistanê bi rengê xwey sorî bedew di xemilîne, ku ew jî rengê xwîna şehîdên Kurdistanêne.

Mîna vê malikê, ku dibêje:

Li hawîr bax û bustane pir xweş

Gul û nêrgiz û beybûn hawîr geş

Dîsa dibêje:

Dev likenin sorgul Ser dihejin sunbil
Xurxur ji avê tê hilm û sirra bê tê

bi rewşeke pirxweş û bi van wêneyên zelal hesta xwe, û ya xuristê tevlihevdikê, û pesneke bê hemta ji xweşikbûna dilbera xwe re di de, ew xurista ku mîna buhişta erdê di de nasîn û dibêje: / Sorgulên wê mîna mirovan, dev likenin/ û sunbul serî li ber sirra bê dihejînin/ lê dîsanê di viradade, helbesta Seyda bi rengekî giştî, û bi vê hesta xwey bilind, dikeve warê evîna welatperweryê de, û herdem şeva welêt ya herî tarî, bi hêrza û hunera giyanê wî ronî û geşdibe.

Û her gav nalîneke kûr û dûr, bi mozîk û bi sûtin û şewat, ji asîmanê sirûda wî, û ji nav dil û cergên wî hiltê û dibêje:

Nalîn ji ber daxên dikul
Jan daye cerg û nav û dil
Lê, min şikestin pişt û mil
Ahî ji destê te evîn

Wuha helbestvanêmе kilasîk û romansiyetê tevlihevdirêse, û kesên romans jî herdem, di ber çavê xwe re, rewşa wendabûna mirovantiyê derbasdikê, wilo jî ev malik bi çîrok û bi sitiranî hatine hûnandin, û weke em dizanin, sitiran û evîn herdû ji karizmên helbesta romansî yên serekanenene, ji ber ku helbesta romans ji hest û ezmûna helbestvan destpêdikê, û êş û derd û serpêhatiyên xwe yên kesane, bi hesteke bilind derêdixe, û peyvên xwe bi hostayî li wateyên wan dipêçe. Seydayê gernas, pêlên derya îro wî didin desthev û davêjin, wêneyeke pirxwş û bi wate jî daye xwe, ku bûye mîna Hirçê birîndar, nalîneke kûrûdûr ji hinaveke bi kalekal, û bi şewat û bi ahîn û axîn, jê têyeder.

Wuha mirovê romans herdem brîndare, û gilî û gazinan ji dem û çerxa felekê dikê, li bajarê mirovantiyê digerê ku karibê serê xwe deyne ser naz balgehin nerim, û xwenên şêrîn bibînê, lê bê gûman ew herdem bi ser vî bajarê zêrên venabê, xwenên wî herdem bicih nabin, ji ber wilo helbestvanê romansî herdem mîna me gotibû-evîndar û kovan û bêzar û birîndare, û xwe, li nav xurbetê, û pêlên derya, û şevên reş û tarî dibîne.

Ev helbestvanê menî navdar jî, vaye bi wêneyeke xemgîn û kovan, ketiye nav pêlên derya kul û xeman, û evîna xwe bi giyan dikê, û mîna hespekî bê zengo û hevsar, serî jê distîne û direvîne, bê ka, wî li çi kelem û kevir û kuçan rasttîne?. Li nav çi xefik û dafikan wî di qelibîne?. Wuha helbestvan, wan derdên xwe li xerîbiyê di de nasîn,

û diyardike, lê ta di vî halê bêzar de jî, ew tucarî Kurdan ji bîrnakê, û raperîneke germ jibo azadiya welat ji wan dixwaze, û dibêje:
Evîna min weke hespê çelenge
Revandim ez, ne zengo û ne hevsar
Cige-rxwîn bese bibêje, pir dirêje
Bese Kurdo, ji xew rabe tu hişyar!...
Wuha jî, gelek caran evîn û hestên netewî û welatperweryê di hinava wî de têne sûtin, û peyva/ bese/ ku peyveke sînorafirîne, di de xuyakirin ku helbestvanê netewperwer, nema vê zordarya li ser welat û miletê xwe, dipejirîne û qebûldike.
Ku em baş binerin jî emê bibînin, ku Seyda helbestên xwe bi rengê dubêt û malikên cûrbecû, lihevhatineke hunerî, di navbera saykolociya mirov, û peyvên malkên sirûdê de pêktîne, û gelek caran (lazîme) di malikên wî de peydadibin, ew jî li kêleka xeyalên bilind, û bi evîneke kûrûdûr, yekîtîyeke resen di helbesta wî, çi romansî çi kilasîk de pêktên,
Helbestvanê me gelekî diltenike, û li ser laşê dilbera xwe diçê û tê, çav û guhan bikartîne, û destê xwe li ser cihên nazik û bedew ji laşê wê, di pelîne û dibêje:
Ji bexçê paxilê çûme dû sêvan
Ji bistanê riwan dêmên hinarî
Ji lêvên erxwewanî min dû sed cam
Şeraba hingivînî nû, vexwarî
Wisa jî evîna dil bi diyardeyeke netewîyê re girê di de, û xwe û welatê xwe, li vê dinê bêkes û bi tenê dibînê, û pir bi bindestiya welatê xwe ve hay dibe.
Dîsanî Seyda, jiyana û helwesta temenê xwe tîne ziman û dibêje:
Evîna dil, te kiriye birîndar
Bihara min, hemû zer bûn gul û dar
Cîhan pêkve di çavê min de xweş bû
Niha, pîrim, di çavê min de bû sar
wuha jî di van malkên romansî de tê xuyakirin, ku Seydayê navdar, li ber bayê payîza temenê xweyî xemgîn, tê hejandin û li ba dibê. Evîna dil ew kiriye birîndar û nalîneke kûr ji hinav û cergê wî dertê, gul û dara jiyana wî zer bûne, û hêdîhêdî, ber bi mirina malikwêran ve gavê xwe davêje, û di kaşê jiyanê re, bi teqil û giranî berjêr di be.
Di malika pêşî de, evîna xwe mîna mirovekî zindî bi gewde dike, û ew evîna germ bi tîra xwey bê ewle, birîneke kûr di laşê vî helbestvanê gernas de vedikê. Tevlî ku ev malikên li jor, bi awakî rasterast û kilasîk hatine lêkdan û siwarkirin, lê bi wate û wêne û

naverok û şêweyeke romansî, û bi mozîkeke xweş hatine lidarxistin, mîna - evîn - birîndar - zerbûn - xweş bû - bû sar - .Ew jî du qûnaxan di temenê xwe de diyarduke, xurtanî û pîrî, bi du kara van pêvajoyan pêktîne /karê buhêrk/ û /karê nuhok/ ango xortaniya xwe mîna bihareke rengîn tîne ziman, û pîr bûn û dawiya temenê xwe, bi zer bûna dar û gulên biharê di de nasîn.

Û çiqasî dinyaya gewrik xweş bû, hevqasî jî piştî pîr bûna wî, di çavê wî de reş û tarî bûye, ev wêneyê tarîbûn û payîzê jî, ji karizmên romansiyetê têne jimartin, di kêş û qafiya xwe de, tîpa /r/ di virade gelekî balkêşe, ku ziman bi xurtayî li şikefta dev dixe, û dengekî xurt û bi ahîn û nalîn jê dertê, û mozîkeke xweş, li ber guhê mirov baş bikartîne, û bi vê tîpa /r/ ve, di dawiya hin gotinên, bi hesret û kovan, xem û xeyalê xwe lidardixe mîna birîndar dar - sar êvar - peyva sar jî wêneyeke bihîztoke, û ew jî dengê mirinê li ber guhê mirov dixe, û tirsa wê di dilê wî de diçînê.

Lê helbestvanê mey dilovan, li ber bayê mirinê bi mêrxasî dirawewste, û ji nêzîkbûna mirov ji mirinê re, wêneyeke romasî pir hêja diafirîne, û ahîna mirov û diyardên xuristê bi hevve girêdi di de, û di şêweya hevgirtina laş de, di de xuyakirin.

Lê helbestvan xweş dibînê, ku roja wî berjêr diçê ava, û şevên tarî perdên xwenî reş û tarî, bi ser rojên temenê wî de, bi giranî berdane, û dibêje:

Şeva reş pej vedane, hate ser min
Ku roja min liber avayê, êvar
Bi ber pêlan ketim bê doz û daxwaz
Dinalim ez wekî hirçê birîndar!

Wuha li temenê wî, di be êvar, û dinale mîna hirçê birîndar, bi hevoka hirçê birîndar re- wêneywke romansî bi taybet bikartê, ji ber ku ew rewşa xwey perîşan, bi rewşa hirçê birîndar ve elaqeder dikê, û e dizanin ku hirç lawirekî pir bi hêze, lê çaxê birîndar di bê, bê qudûm û bê qiram xwe davêje erdê, urfeurf û kalekal û nalîn jê tê, û tevlekut nema jê çêdibe, peyva /êvar/ jî bi wateyeke manewî hatiye bikaranîn, û di vê babetê de, ew mirov dixe nav gûmanan de, û nêzîkbûna bûyereke mezin, Mîna mirina mirov tîne berçavan.

Êvar jî ewe, çaxa ku xurist ber bi şevê de diçê, û hinbihin roj diçê ava, û lawir û sîper ber bi cih û lûsê xwe ve dilezînin, û bêdengiyeke bi tirs, bi ser xurista ku berya anha ronakbû dibare, û jiyan dikevê xewa mirinê de.

…….